4- Tu kes mafê wî nîne ku bi zorê keçê bide şû(mîr) bi-leks zewac û pêkanîna malê li ser evîn û dîlkwa-zîya kur û keçê tê avakirin. Dayik, bav û bira mafê wan ê wiha nîne ku keç û jîne bi zorê bidin şû.

5- Aligirê Heq, gava dig-ihiê hev ji dêvla silavê tenê navê "Heq" hildidin.

6- Aligirê Heq, di salê de divê ji dexi û hatinê xwe

dehyekê bidin şêx da ku ji bo feqîr û hejaran bê terxankirin(amadekirin)

7- Her gava ku ji ali şêx ve biryara şer û cihadê hat dayîn divê bi zûyi xwe ha-zir bikin.

8- Edet û rêveçûnên Teriqeta Heq ên taybeti bi xwe hene û endamên vê teriqatê mafêwan ê eş-kerekirina bir û rayen xwe ji bo nenasan niye.

Ev bûn heşt benden Teriqeta Heq, ku zedetiri sed hezar kes ji daniştiyên(rûniştiyên) Kurdistana wî ali, aligiri lê dikirin.

Piştî koça dawî ya Şêx Ebdulkerîm, birayê wi yê piçük ê bi navê Şêx Reza li súna wî rûnişt û fireyî da karûbarê xwe, bû xwediyê mirid û dewlemendiyek gelek, navê Mehemedê Mêhdî lîbû û biryar da ku hemû miridên wî kincen ji telis durust bikin û li xwe kin.

Piştî derçûna vê biryare, bi deh hezaran kes ji xel-kên Kurd ê hejar ci telis hebûn, kom kirin û kira-sen telisin li xwe kirin. Her ku telis li xwe kirin Şêx Reza biryar da ku hemû aligirê Heq, her yek da-reki qule(kin) bi qasî enda-za copê polisan durust bi-kîn û her gav wî darî bi xwe re bigerîn û biparêzin. Xelk, ji ber saftiyê ji wan-wetnê rojekê bi hîmeta Şêx dar wê bibin tiving. Ji vi xelkî re "daregule" dihat go-tin.

Gelek tê re neçû ku xel-kê hejar ê Kurdistanê ku hergav tiyê xeber û qewimîdanen nuh bûn êris birin ber bi barega (koşka) Mame Reza û hemû rûniştiyên dorûbera Silêmaniye, Kerkûkê, Koyê, Raniyê û Sûrdaşê bûn telispoş û darbidest. Şêx Reza gihaş wi perê wê hêz û karîna ber-berekaniyê. Dawiya dawi, Şêx hat ser wê yekê ku bi-beje; Bexda, Sûriye û hwd. divê ji destê kafiran bê riz-garkirin û xelkê Heq divê

xwe ji bo xezayê hazır bi-kin.

Miridên çareres ku hemû gündi, kirêkar, cotkar, pale û nivekar(cenan) bûn ketin firotina zevî, milk û tişt û miştên xwe û her tişt bi erzanî firotin da ku di dema çûna xwe ya şer de tişteki wan li pey wan nemîne. Lê belê hinekên wan ku tê-ghîştitir bûn rojîn pêş xis-tin ber çav û birek zevî û zardên xwe hiştin.

Bi vi awayî piştî çel rojan ferma cihadê hat derxistin û hemû aligirê Heq, yên ku dikaribûn şer bikin telis li wan û dar di destê wan de ku hejmara wan zedetiri heştê hezar mîr û jînî bûn li deşta Sûrdaşê kom bûn û ber bi bajarê Kerkûkê ve bi rî ketin. Kar-bidesten hukûmetâ wê de-ma Iraqê ku ev bihistin, ketin tîrsê ku wê berê vê heşametê çawa vegeerin.

Ve qewimandinê di sa-la 1324'ê hicri şemsî de rû da. Miridên Heqê li deşta Kerkûkê kom bûn. Lê belê memûrên Iraqê her çend çavên wan li rî bûn êris ne-hat kirin. Tenê dîtin ku ro-jane nêzîki hezar kesen bi telis û darbidest tê bazara Kerkûkê, nan û goşt û tişt û miştên pêwist bi perê xwe dikirin û vedigerin ordûyê û hîc ziyanek ji wan nayê. Tevi vê yekê cardin tîrs di wan de hebû û xeber gi-handin ba Şêx ku vegere, lê Şêx xwe neda ber. Vê carê Şêx û berpirsiyaren wan bang kirin ba waliyê Ker-kûkê û li wir dest danîn ser wan. Ji Şêx xwestin ku fet-wayekê binivise û ferma-xezayê rake, bişîne û mirîdan vegerine ser mal û halê wan.

Şêx Reza ji ku jê re diyar bû ku raperîn bi destê vala bi ser nakeve, fetwa nivisi. Karbidesten hukûmetê ji fermanek derxistin ku ew kesen ku mal û zevî û hwd kirine divê bidin xwediyen wan ên berê.

Bi vi awayî ordiya mezin a telîspoş û darbidest vege-riya ser mal û halê xwe. Şêx Reza û xelîfîn wî ji heta de-mekê li Kerkûkê bindest bûn. Piştî wê, Şêx bi des-tûra hukûmetê vege-riya Silêmaniye. Di jêr çavdêriya dewletê de li malekê dijiya.

Navê şêxiyê ji ser xwe ra-ki û ji her kesi re got ku jê re bêjin "Mame Reza"

Her çiqas vê qewimandî-nê rû da û Mame Reza ji Mêhdîtiya xwe poşman bû, lê belê miridên wî her diha-tin.

Mame Reza vê carê fet-wa da ku aligirê Heq telis ji xwe bikin û darênen xwe bavêjin. Ji bo wê yekê ku jîn û mîr ji hev bîn cihêki-rin, mîran serê xwe tiraş nedikirin û tûmîk berdi-dan. Jinan gerdanlixa(mir-warîtiyê) Sumbul dixistin hustiyê xwe. (Hêjayî gotinê ye ku sumbul giyayekî bin-xweş e) Miridän disa pey-rewiya destûra Şêx kirin û ketin meydanê. Vê carê xel-kê navê wan kir: "Firqayên Diwaneyan". Bi vi awayî sê nav li vi taqîmî hat kirin: Heqe, Dareqûle, Dîwane ku "Dîwane" navê wan ê daw-yê bû.

Mame Reza piştî wê yekê ku du salan di bin çav-dêriya hukûmetê de ma hat azadkirin û xaneqeya xwe bir avayıya Kelke Simaqê li nêzîki Sardê. Di sala 1340'ê hicri şemsî de her li wî gündi koça dawî kir. Niha ji rûnişti li wê navçê hene. Ciye balkêsiyê ye ku ji bo ci gelo meram û baweriya vê fırqê ji ali lêkoler û komelnasen Kurd ji bo me-nehatiye ronikirin.

Bi belavkirina vê gotarê em ji mamosten wî aliyê Kurdistanê dawê dikin ku çilottiya bîr û baweri û ser-pêhatiya Heqan ji bo me-ronî bikin.

Dûmahîk di hejmara bê de

Siyaveş Kesrayî:

"Kultura Kurdi wek zêrekî, wek xezinakê di bin axê de maye"

□ Armanc: Mamoste em dizanin ku hûn helbestvaneki Iranî yê pêşketî ne. Ji kerema xwe re hûn dikarin bi kurtayî qala jiyana xwe bikin û sedemên ku hûn bûn helbestvan çibûn?

□ S. Kesrayî: Bi gumana min helbest û helbestvanî di heyvanê me hemû Iraniyan de heye. Bi raya min carna piçüktilrin tişt dibin sedem ku mirov di warê huner de perwerde bibe.

Ez di binemaleke wiha de hâtime dinê ku apê min helbestvan bû, diya min xwendevan bû û bavê min kêmoxwendevan, dilêr, demokrasiperwer, tufenkî û siwarekî hêja bû.

Ez bi xwe zarokê malê yê siyan bûm. Ji piçukiya xwe de bi nexweşîya bronşidê ketim. Doktoran xwestin di hewayek pak de bijim. Ji ber vê yekê malbata min, min hinartin gundêñ herêma Mazenderanan. Ew manzarayen destpêkê li gundêñ bakur, ew çarînen ku ji alî gundiyan ve bi şev û roj li mezreyan dihatin gotin tesirek li ser min hîstîn.

Perwerdekirina min a paşî li cem apê min bû; ewî jo bo ku li dibistanê musabaqa helbesû bikim, helbest bi min dida jiberkirin. Bavê min jî helbesten pêlewanen Şahnamê ji min re dixwend. Perwerdekirina apê min û diya min "Hafiz" bi min dabûn naskirin.

Bi ví awayî ji piçukiya xwe de ez ber bi helbestvaniyê ve çûm. Hin di sinifa sisiyan de, bi helbesten bi wezin û qafîye ku ji wan re "şîr" digotin, hatim nas-kin.

Bi kurtî min ji sala 1941'an dest bi helbestvaniyê kir û nuha ji ví karî didomînim.

□ Armanc: Wek tê zanîn helbestvanî li Iranê di demen kevn de û iro jî bi pêş ketiye. Helbestvan û niviskarén Iranê hin di sedsalen navîn, weki Firdewsî, Saadî, Hafiz, Xeyam û wd. berhemên hêja afirandine ku di klasikên dinyayê de ciyekî girîng dirin. Pişti hatina Xumeynî gelo rewşa kulturî û hunerî kete çî warî?

□ S. Kesrayî: Dikarim bibêjim ku welatê me, welatek e ku helbest têde dizên. Ciyeke helbestê yê girîng di têkiliyên rojane yê gelê me de heye. Gel bê ku agah lê be helbestvan e, pirtûkîn Hafiz û helbestvanen din, weki Quranê, weki pirtûkîn pîroz di hemû malan de hene.

Li gor nêrîna min şoreşa ku li Iranê li dar ket ji gelek aliyan ve ji bo helbestvanen me ciyê lêkolin yê. Qewmandina vê şoreşê gelek helbestvanen me xafîl girt.

Wexta gel bê ser sahnê û guher-tinê aborî, siyasi civakî û leşkerî bixwaze; pêre guhertinê kulturî jî dixwaze.

Mînakek biçük; di destpêka şoreşê de tîraja pirtûkîn ku berî

şoreşê hezar an herî zêde sê hezar bûn, pişti şoreşê gîhiştin sed û pêncî, sêsed hezari. Ev jî dide xwiyakirin ku gelê me wexta welalet û hukûmet wek a xwe dît û qebûl kir kultur jî xwest. Bi dil û can û hemû imkaniyeten xwe ber bi kultura xwe ve çû. Xelkên wilo wexta ku her tiştî dixwazin helbestê jî dixwazin.

Dixwazim bûyereke interesan ku min bi xwe di şoreşê de diye bo we bibêjim.

Di destpêka şoreşê de li kolanen "Şamîrana qedim" û "Meşeda quba" bi qasî sed hezar kesî meş dikirin. Wexta gîhiştin "Qulê Hekim" hejmara wan ji milyon û nîvî zêdetir bûbû. Leşker bi hemû hêza xwe ketibû pêşîya wan. Fermâneyê leşker di hoperlorê de got "destûra min a gulebarankirinê heye" ji aliyê din ve xwendevan û xelkê sîngêñ xwe vekirin, jinan çarikên xwe çîrandin û hewar kirin gotin "ha ji we re sîngêñ me gulebaran bîkin", bi ví hawî gîhiştin devereke wiha ku sîngêñ her du aliyan kete hev. Di wê demê de fermande yek-dudu dijmart, dixwest bi hejmara sisiya destûra gulebarankirinê bide. Hingê di orta gel de dengek bilind bû "Biraderê erteşî çîra birader kuş!" (Birayê leşker çîma birayê xwe dikûjî) li ser vê gotinê ev mücîze çêbû; leşkeran çekên xwe danîn, sîngêñ xwe ji milet re vekirin û ew himbez kirin. Ev bûyê bû destpêka rojîn din...

Ez geleki li ví mirovê ku ev gotin ji deva derketibûn geriyam, lê tu kes li van gotinan xwedî derneket. Ev gotin, helbesteke şoreşê bû. Ew helbestek bû ku ji manewiyata gel derketibû. Van helbestan kes nabêje, ew bixwe têñ çandin. Wexta meriv çav li helbestê digerîne tiştîn seyr derdikevin holê:

Kurtîn helbest e û wezneke ku cara yekem di zimanê Farisî de dibînim. Him wezin û him qafya wê heye, lê wexta meriv lê hûr bibe û bibîne ku ev helbest fiil (lêker) tê de tune ye. Ji ber vê yekê ev helbest dixwaze bibe şiar û şiar jî ji bo ku tesîra xwe bike, xwe girover dike û ji bo bikaribe zêdetir here hecmê xwe biçûktir dike. Pişti wê weki vê helbestê gelek helbest derçûne. Ev mînakek biçük e ku çawa cûreyek helbest li welatê me çê dibin.

Iro di welatên dinya sisiyan de, hunermend bike-neke xwe di nav polîtikayê de dibîne. Rewşa ku têda diji wî mecbûr dike. Ev çarenûsa huner û edebiyata dinya siyîya ye...

Di dema Şah de hinek ronakbîren me ne amadebûn ku şoreşek wilo bibînim; ji ber ku bawerî û rihetiya wê demê ev tişt ji wan nedixwest. Daxwaza dadgehîn Şah jî ew bû ku kultura gelêri û şoreşgerî ber bi bayê de here. Vekirina zanistgehan, dayina bursen xwendinê, teşwîqkirina xelatdayinê û li cejnîn ku ji bo hunermendan saz dikirin mebest

ew bû hunermendan ji dervî politikayê bihêlin.

Ew hunermendan ku aligirêne gel bûn û nivîsên xwe di formekê çînayetî de dianîn ziman tercîh dikirin ku berhemên xwe bi formen sembolik û temsili raber bîkin; ji bo ku nekevin "xeteriyek" mezin. Ev kar wijdanê wan rehet dikir. Sistemê jî ji bo ku "xeterî" têda tunebû çavê xwe li wan digirt. Lîbelê guhdar û xwendevanen wan jî ji rewşenbîran pê ve kes nîn bû. Bes ew tenê tê di gîhiştin. Min ji te ra digot te ji min re digot. Me ji helbest û axaftinê hevûdu baş fam dikir, bê ku gel naveroka wê ya şoreşgerî, ya ku pêwîst bû têbigihê.

Sistem bi vê yekê razîbû û em jî pê razîbûn. Eger yekî ku nigê xwe zêdetir dirêj bikira, "nafermanî" bikira û bixwesta bibe hunermendê gel, yan diket zîndanê yan idam dibû yan jî işkence lê dihat kirin û ew neçar dibû ku li mala xwe rûnê. Nimûnên van tiştan gelek in. Hûn bi xwe dizanîn ku di dema Şah de çiqas kes hatin zîndankirin û kuştin an jî pênuşen wan hatin qedexe kirin.

Lê iro lazim e hunermend bi milyonan bi girsehiyên gel re bîaxive, tiştî ku gel ji wan dixwaze divê têbigihê û bizanibin.

Lê belê wexta ku bûyerek rû dide ji bo ku hunermend wê binrixine jê re jî demek divê. Ji bo ku mîşa hingiv li ser gulê venne, şîreza wê bimije û biçe di kewarê de hingiv çêke demek jê re divê.

Hunermend jî divê ku bûyer û armancen wê bigre û di xwe de perwerde bike; ji dil û hisen xwe derbas bike; wê çaxê dê bikaribe tiştekî biafirine. Pişti şoreşa Fransa ya mazin(1789) romanek mezin, gelek dereng li ser wê hatiye nivîsin. Wexta Napolion êris bir ser Rûsyayê, pişti vê bûyerê bi sedsal Tolstoy romana xwe ya "Şer û Aşî" nivîsiye.

Nuxteyek din jî ew e, ku hukumetek hat li ser pêlên şoreşê siwar bû, şoreş daqurtand û bidest xist. Bi alikariya milyonan xelk pêwistiya wan bi helbestvan û nivîskaran tune bû. Bawerî bi huner nedianin.

Di Qûranê de wilo hatiye nivîsandin: "Helbestvan ew kes in ku rê şanî 'gumrehan'(kesen ku rîya xwe şas kirine) didin."

Wan, ji bo ku rola helbestvanan kêm bikin digotin "Quran bi xwe helbest e" Belam rast e ku hinek hevokên piçûk yê helbesti di Quranê de hene...

Pişti serkutkirin û têkbirina hêzen şoreşer hate holê û şerê Iran û Iraqê lê zêde bû, desthilatdar hêdi-hêdi têgihiştin ku divê ji hêzen din yêñ civakî alikariyê bigrin; ji ber ku hêza wan têra wan nedikir. Rêga dan hemû hunermend û nivîskaran, bi şertekî ku her tişt di xizmeta İslâmî de be û propaganda şer û imaman bike. Niha jî ev politika berdewam e. Ew dixwazin nivîskar û hunermendan ku xeteriya wan wek a

Siyaveş Kesrayî Sekreterê Cemiyeta Alîgîrêne Aşti li Iranê û sekreterê duyemin e Şüreya Niviskar û Huner-mendanen Iranê ye. S. Kesrayî bi xwe şair e. Heta niha 13 diwanen wi çap bûne.

Hevalê me H. Holi ev hevpeyvin bi wî re kir.

Em sipasî hevalen Siyamend û Rehim dikin ku di wer-gera vê hevpeyvinê de alikariya me kîrin



Siyaveş Kesrayî: "xezîneyek me ya zér û zîv heye, divê rojekê kîşif bibe"

şoreşgerên çep tune ye, bi şê-weyeke ku ziraran negîhînin hukumetê, li hev bikin. Di encama vî tiştî de niha li Iranê çape-menîya edebî zêde bûye. Tiştîn ku dibihi zîm iro li Iranê hinek nivîskar û hunermend di çirok şanoyen xwe de car-carna rexne li hukumetê dirin. Bi kurtayî ev e qonaxa ku huner û helbesta me têre derbas dibe.

□ Armanc: Gelo di derba-re Kultur û hunerê Kurdi de tu zanîna we heye, an ji hûn ji helbestvan û huner-mendan Kurdi tu kesî dina-sin? Li gor we iro helbesta Kurdi di çî warî de ye?

□ S. Kesrayî: Berê

rêga(icaze) bidin ez bersîva pîr-sen we yên besê duemîn bidim.

Gelê Kurd geleki kevn e. Di navbera çar ciyayen çar welatan; Tirkîye, Iran, Iraq û Sûriyê de dimîn. Pirr heyf ku ev cu-dayiya cograff bûye sedem, ku Kurd li van her çar welatan wekî kêmeyeti bîmîn. Ji ber van formen cograff, Kurd him têkiliyên wan bi hev re ne girêdayî ne û him jî ji hev ne cihêne. Ji ber vê rewşa ketina kêmeyeti, him ji mafîn xwe bêpar mane û him jî nikaribûne azadî "serbix-webûna xwe bidest xin û kultura xwe bidin nasîn. Ji ber vê yekê kultura Kurdi wek zêrekî, wek

HEVPEYVÎN HEVP

xezinakê di bin axê de maye.

Carna di çiyan de yek rehek zêr yan zîv peyde dibe; ez wek Siavîş Kesrayî bi forma yek beytekê an destanekê be ji wê dinasim. Ez kultura Kurdî ne di riya pirtûkan de dinasim; wek destan û beytên ku xwe bi forma devkî ji neslek sipartiye cilekî din dinasim.

Bi kurtayî xezîneyek me ya zêr û zîv heye. Divê rojeye kîşif bibe. Çi mixabin heta niha ev kar baş nehatiye kîrin, ku ew ji beşek ji mahrûniyeta gelê Kurd e.

Ez bi xwe yek-du ristên Kurdi ku min jiber kîribû dizanîm. Weki: "Teniya daxê bî ne nîş be pam bî" kurteristên ku dizanîm zêdetir Kirmanşahî ne, nêzîkî Kurdistanê ye.

Min Mele Eware nas dikir. Ew ji wan helbestvanê baş yên bi nav û deng bû. Di nav xortan de ji min Nabdel nas dikir ku gelek helbesten xweş dixwend. Ew bi xwe ji Fedaîyîn Xelk bû, hate kuştin. Bi daxewa tiştekî din ê berfîreh li cem min tuneye.

◻ Armanç: Wek tê zanîn mesela Filistîn ber bi çare-serkirinê ve diçe. Li gor gelekk pîsporê politik pişti helbûna mesela Filistîn, problema herî mezîn li herêmê wê pîrsa Kurdi be. Hûn weki Sekreterê Komîta Aştiyê li Iranê, li gor we bêyi ku mafê netewî û demokratî yê 25 mîlyon gelê Kurd bê dayîn mumkûn e ku li herêmê aşti çê bibe?

◻ S. Kesrayî: Bi vê pîrsa we em hinek ji mesela helbestvanî û edebî derketin. Hûn dixwazin em hevpeyvîna xwe li ser berpirsiyariya min a din, ku Sekreterê Cemîta Alîgîrîn Aştiyê li Iranê me, berdewam bikin... Bi qasî ez dizanîm bi yek gotinekê bersîva pîrsa we didim û dibêjim NA! Ango bêyi liberçav-girtina mafê 25 mîlyon mîletê Kurd yê dilêr ku di nav çend sînorêne hevbeş de dijî ku hemû ev zîlû zor qebûl nekîriye û serê xwe dananiye, aşîtyeke bi berdewamî li Rojhilata Navîn çê nabe. Ez ne wilô xwedî nîrîneke paşdemayî me ku bibêjim, ev mesela wê bi hêsanî careser bibe. Mixabin di roja iro de bi tevayî hemû meselan hêz(qudret) çareser dike. Dixwazim bibêjim ku gelê Kurd ji xwediyê hêzékê ye; ango bi salan e ji bo ku mafê xwe bi dest xîne û xwe bide nasîn, bi nenûk û diranê xwe dixebeitê û xwîna xwe dirjîne. Ez di wê baweriyê de me ku wê azadî û serxwebûna xwe bistîne.

Dîsa di wê baweriyê de me ku ewen xwedî hêzén mezîn in nikarin bi bombayên kimayî û atomî û şerê fuzeiyê vê dînyayê idare bikin. Iro mesela gelê Filistîn ber bi lihevhatinê diçe. Tasawir û xweşbîniya min a Marksisiî ji min re dibêje ku zû yan dereng gelê Kurd ji wê ber bi lihevhatinê ve biçe.

Lê belê hûn dizanîn ku problemen li herêma me gelek aloz û dijwar in. Divê mesela Afganîstanê forma xwe bibine û aram bibe. Ev aramî têkeve Pakistan û Iranê û ji Iranê ji têkeve herêmên cîran.. Mesela Filistîn wê hineki Iraqê û Sûriyê aram bike. Edî hêdi hêdi dora me ye. Em ji li gor nobeta xwe ji bo hêza xwe nişan bîdin ber bi wî aliye ve diçin.

Gunter Wallraff li Tirkîyê zîlîm û zordestiya li ser Kurdan bi çavê xwe dît

"Toximê Nefretê Ji Zaroktiyê Dest Pê Dike"

Gunter Wallraff kitêba wî ya bi navê "Yê Herî di Binî de" ku li ser rewşa karkirê Tirk ên li Almanya Federal hatîye nîvîsandin tercumeyî gelek zimanî bû. Bes çapa bi zimanê Almanî nêzî 3 mîlyoni hat firotin. Tu kitêbek din li ser meselîn civakî hewqas nehatiye firotin.

Heta, ew kesen ku pirtûk li ser rewşa wan hatibû nîvîsandin ji hewcedariya xwendina wê dîtin. Ev pirtûk bi zimanê Tirkî ji heta nuha bi sed hazaran hatiye firotin û hin ji di nav lîsta pirtûken ku herî pir têni firotin de ye û nîvîskarê wê li Tirkîyê gelek meşhûr bûye.

Bi xêra vê meşhûrbûna xwe, ji hukûmeta Tirk destûr stend û bi çavê xwe ew zîlma ku li ser aqeliyet û muxalefa-ta li dij rejima nuha, dit.

G. Wallraff ji aliyê Yekîtiya Nîvîsakarên Tîrkan û Komela Mafê Însanî ya Tirkîyê ve hatibû dawetkirin. Bi

xêra meşhûrbûna xwe ya li Tirkîyê rewşa Tirkîyê ya ku rejimê nedixwest bê ditin, bi çavê xwe dît.

G. Wallraff ew tişten ku dît pîr pê ecêbmayî ma. Wî, rewşa Tirkîyê ya ji alî mafê însanî ve wek rewşa Sîliyê ya di dema diktatoriya Pinochet de dît û bû şahidê zulma li ser girtiyen politik ku bûye perçeyek ji jîyana rojane û her wîsa bû şahidê zîlîm û zordestiya li gelê Kurd dibe, bêyi ku misqalek ji ji vê zulm û zorê kêm bibe.

G. Wallraff tam di wexta gesbûna serihildana Nîsêbin û Cizirê de çû Kurdistanê. Di vê nîvîsa jîrîn de G. Wallraff ji rojnamavaneke Kolnî; Simone Sitte re bahsa tişten ku ditiye kir.

Ev nîvîs di 6'ê Gulanê de di rojnama rojane ya Swêdî "Dagens Nyheter" de çap bû. Heval B. Aras wergerand.

Pîrs: Gelo berî ku tu herî, te di derheqê Tirkîyê de ci texmîn dikir û texmîn te çiqas rast derketin?

Gunter Wallraff: Bi rastî ez pîrr caran ecêbmayî mam. Her wekî urf û adetên mederşahî tê parastin ku rehîn wan ji dema antîk têni û hîn li vî yan li wî ciyî derbas dibin. Welat ji sedsalan vir de ye bûye warê hevîrê tevîhevê kulturê cihê ku ji xeynî Kurdan geleki nêzî hev in. Ew, grûba herî mezîn in ku hejmara wan bi mîlyonan e. Ew, têni teqîb kirin, heqaret û işkence li wan tê kirin.


Pîrs: Tu di gera xwe de çûyi Diyarbekrê ji ku nufusa bajêr ji Kurda pêk tê û dema ku li wê mintiqê hînek tevîhevî çebûn tu li wir bûyî. Te li wê mintiqê rewşa Kurdan çawa dît?

Gunter Wallraff: Sebebên wan tevîhevîyan ew bû ku leşkeran li Nîsêbinê nehit ku xelk li gor adetên xwe cenazê xwe rakin. Ev tişt, bû sebebê meş û mitînga Cizirê ji û leşkeran kesen ku di meşê de bûn gulebaran kirin.

Dawîyê hate gotin ku xelkê kevir avêtine ji leşkeran de, lê heta Reisê Belediya Cizirê, ku ew endamê partîyeke İslâmî ye û nêzîkê rejima hukûmetê ye, got ku leşkeran ev rewşa han hazir kir. Di pişt re xelkê bi hawakî pasîf li ber xwe da, dikanên xwe girtin ji bo ku ji eskeran re xizmetê nekin. Lî hukûmetê ev tevgerên han wek serihildanê qebûl kir û wek bersîvî ji hîn pîrtir leşker sand mintiqê.

Em êvarê dereng gîhîstîn Cizirê. Bajar wek ku hatibû işxalkirin. Panzer û leşkeren ku her gav ji gulebarankirinê re hazir bûn, li her derê hebûn. Bi vê rewşa han xelk di nav heyecaneke mezîn de tê hîştin û helkirina meselê ji ne mumkun e, rewş di-kare xerabtir bibe.

Grûbek xusûsi heye ku ji wan re dibêjin "Tîma Xusûsi", ew ji bo şerê li dijî gerîla hatine hazirkirin û ji tişten bikin ji nayêne mesûl girtin. Ew, pîrr kêm dikarin bigîhîjin terorîstan, ji ber ku ew ji Sûriyê têni û li ciyê asê ne. Lê dewlet, bê ku ferqê têxe nav xelkê mintiqê, wan ji malen wan derdixin û pirê caran dora hemûyan digrin û wan teslim digrin. Ji bo vê yekê bi Kurdi axaftina wan



Gunter Wallraff: Min bi çavê serê xwe dît, zarokek ji ber bê imkaniya aila wî, bê doktor û bê derman mir.

jî besî girtina wan dike.

Pîrs: Di bin şertê weha de, bi xelkê re têkili danin pîrr zahmet e. Reaksiyona wan li hember te ci bû?

G. Wallraff: Tevî ku talûka girtina wan hebû ji, pîrr dixwes-tin ku bi me re têkiliye deynin û rewşa ku tê de ne ji me re bidin diyar kirin. Li gundekî, wek nûmûne; ji me re gotin ku berî nuha bi çend mehan hemû zilamên wan hatine girtin, ew birine pîsiyê wan bi wan dane xwarin û dawîyê ew berdane. Li ciyekî din ji pî-rekên nîvtazî mecbûr mane ku zilamên xwe yê ji işkencê derbas bûne ji destê leşkeran derxin. Bi vê tada sistematik li ser gelê Kurd, dixwazin baweriya wan a bi xelasiyê wenda bikin. Lê ew ji dibe sebebê ku toxumê nefretê ji zaroktiyê de dest pê dike û wan diğine PKK'ê. Ü bi rastî ji PKK

yîna te ew bû ku te dixwest tu hefsa Tirkîyê bibinî. Lî min digot qey ji grewa xwe birçihîştina sala 1989 a û vir de kesî bernadin?

G. Wallraff: Bi rastî ne rehet bû. Lî dawîya dawî min Wezareta Adalete ikna kir ku armâna min ne ew e ku ez tiştekî sansansiyonal bikim, min got aramanaca min bes însanî ye. Belkî ji tîrsîyan ku iznê nedin min, mumkun e fîkirîbin ku, ezî bi riya "hunerê" xwe yê berê xwe bigîhînim hundir hefsê.

Bi rastî li wir ji ji ber toleransa wan ez ecêbmayî mam. Em bi hemû girtiyen ku me dixwest em bi wan re biçeyivîn, peyivîn. Hefsiyan ji dîtinin xwe serbest ji me re gotin. Em gîhîstîn wê qenatê ku ew tade û zîlma berê nuha dom nake.

Pîrs: Te got ku sebebê çû-

Çirok

Xweştiyî min

Niha nameya te gihîst destê min, tu tê de dibêjî, ku te ji bo hatina min û mana min a li Sacramento, hemû tiş amade kirine, dîsa ez dizanim, ku ez bo Zanîngeha Kaliforniyayê, beşenê endaziariya(muhendizî) sivîl hâtime qebûlkirin.

Heval, divê ez sipasiya te bikim, li ser wî karê te ji min re kirî, lê tu dê biguhişî(şâş bibi) dema tu vê xeberê bibihizî. Mustefa... baweriya te bê, ku ez ne dudil im, lê dikarim bêjîm ku niha ez her tişti ronî dibînim.... na heval... na.. min fikra xwe guhert, ez li dû te nayêm warê "keskatiyê, avê û dêmîn ciwan" her wekî te nivisiye, lê ezê li vir bimînin û tu caran ji nayêm.

Heval Mustefa, bi rastî ez pir dêsim ku em jîyana xwe bi hev re, li ser rêçekê derbas nakin.. a niha dengê te tê guhî min, ew soz û peymanen me bi hev re dabûn, tu bi bîra min tînî, 'ku em jîyana xwe bi hev re bîborînin û tu caran ji hev cuda nebin.' Û çawa me gazî dikir: "Emê zengîn bibin", lê heval ez tu riyê li pêşîya xwe nabînim, belê hîn baş di bîra min de ye, roja ku ez li meydana bala-fîrxana Qahîrê rawestiyam, min destê te digivaşt û çavê min li motora har a balafîrê bû, a.. wê caxê her tiş di gel motorê dizi-vî. Tu bi xwe li beramberî min, bi dêmî xwe yê tîjî û bêdeng, sekinî, rûyê te her ê berê bû, yê ku min li taxa "El-Şecîye" li Xezzeyê naskiribû. Û tu nehatibûyi guhertin; ku ew xîçen(xetên) fireh nebin, em bi hev re mezin bûbûn û tim û tim em ji hev têdihiştin, me soz bi hev re dabû, ku em her û her bi hev re bin...lê belê....

"Çarîkek maye wê balafir rabe, li valahiyê mîze neke, guh bide min.. sala bê tu dê biçî Kuveytê, hînek pera bidî ser hev, ku tu pê bikarî ji Xezzeyê derkevî û bê Kaliforniyayê, me bi hev re dest pê kiriye û divê em bi hev re berdewam bikin..."

Wê gavê min zêrevanî li herdu lêvîn te dikir, çawa bi lez diliviyân, tu welê bêbir, bê bîhnok û bê rawestandin dipeyivî. Lê hingê, min hest dikir, hestek şelû, ku tu bi duristî ji reva xwe ne razî yî. Te nedikarî, bi têne sê sedemên ku te pal didan vê bazdanê bihejmîfî, ez bi xwe ji di hundîr xwe de hildîwesiyam. Lê his û bîrîn rontir ew bûn: Çima em Xezzeyê nahêlin û narevin...bo çi..? Rewşa te baştir bû ji ya min, çimkî "Marifeta Kuveytê", kar da te, lê neda min.

Di şergera wê hejarî û perşaniya ku ez tê de dijiyam, hînek caran pere ji te dihiştin destê min û te dixwest ku bi deyn bin, neku ez şerm ji xwe bikim û wernegirim, te rewşa min a malê baş dizanî, disa te dizanî ku ew perê ez ji xwendegêhî Uneskoyê werdigirim, gelek kêm e û têra debara min nake, ku diya xwe, jinbir xwe ya jinbî her çar zaro-kên wê, xwedî bikim.

"Baş guh bide min, her roj namayan ji min re bînivise... her seet, her gav... ci nemaye, balafir wê bi ba bikeve, bi xatirê te, ne.. bêje heta hevdîtinek din. heta hevdîtinek din..."

Lêvîn te yê sar ketin ser rûyê

min û te rûyê xwe ji min bada balafîrê, dema careke din te li min nêri... min rûndikêne te dîtin...

Piştî hingê " Marifeta Kuveytê" kar da min, ne pêwîst e her tişti ji te re dubare bikim, jixwe min hemû tiş bo te dinivîsin,

vekêse xwarê.. bêtir ji bi qasî ku ez vekêsa me... divê birevim!

Mustefa, tu van hi û hesta tê-digîhê. Çimkî tu bi xwe tê de jîyayî, ev ci tişte şelû ye me bi Xezzeyê ve girê dide û nahêle em baz bidin? Çima em li dû naçin,

pê dikir ku diya min û jînbira min, tiştekî ji min vedişerin, tiştekî ho ku zimanê wan nagere pê ji min re bêjin..tiştekî seyr ez nikarim bi ci awayan tuxûbêñ wî eşkere bikim! Ez hîn bibûm ku min Nadiya xweş bivê, ez hîn

- Nadiya, min ji te re ji Kuveytê diyarî anîne, gelek diyarî, dê li benda te bim, ta ku tu baş dîbî û ji nexweşxanê derdekevî û tê malê, pantorê sor ku te xwestibû, min kirî, min kirî...

Derekew bû hat ser zimanê min, lê min welê hest kir ev cara yekê ye rastiye dibêjim, belê pa Nadiya velerizi her wekî elektrîkê girt, û serê xwe bi bêden-giyek bi sehm çemand. Min hest bi rondikêne wê dikirin, pişta de-stê min ter (şîl) dikirin.

- Bêje min, Nadiya ma tu hez ji pantorê sor nakî? Serê xwe bilind kir û li min nêri, wê bipeyivîya. Lê rawesta û didanê xwe li ser hev sîrikandin, paş min dengê wê ji dûr bihîst:

- Mam ! Destê xwe dirêj kir û bi tiliyên xwe lihîfa spî rakir ranê xwe yê ji binî hatî birrîn nişanî min kir.

Heval.. Ci cara ranê wê yê ji binî hatî birrîn ji bîr nakim, na.. Ci cara wê xema di dêmî wê yê şîrîn de gewde bûyî ji bîr nakim. Wê rojê ez ji nexweşxanê derketim ser cadeyên Xezzeyê; Mistafa... Xezze.. nuh dihat pêş çavê min, nuh, tu caran min û te wiha nedîtitibû. Kevirên komkirî li dest-pêka taxa El- Şecîye, cihêne malîn me lê, difikirîn. Heçko ke-tibûn wir, da taxê rave bikin, ew Xezzeyâ ku em di gel xelkê wê yê ciwanmîr, heft salan di karesatê de jiyan. İro tiştek nuh bû dihat pêş çavê min; her wekî dest-pêk e... bi tenê destpêk, nizanîm çima min hîzir dikir ku hîn ser e, min hîzir dikir ku cadeya mezin a ez li ser ber bi malê diçûm, dest-pêk piçûk e ji bo cadeyeka dirêj û dirêj ku digehe Sefed.(1) Her tişte li Xezzeyê, gişt Xezze, xem û kul û kovan divelorandin, ji bo piyê Nadiyayê yê, ku ji serê ranî hatiye birrîn.

Xemek giran; ji tuxûbêñ giriyye derbas dibû; qebxwestin e, ne ji hindê ji pitir e, tiştek e wek veg-erandina piyê hatî birrîn!..

Ez derketim ser cadeyên Xezzeyê, cadeyên tîjî ji tava geş a rojê.

Gotin min ku piyê Nadiyayê nema, dema wê xwe avêt ser xwîşk û birayê xwe yê piçûk da ku wan ji gurî û bombayê bi xanî ketin, biparêze. Nadiyayê dikarî xwe xelas bike û baz bide...piyê xwe xilas bike, lê wê nekir.

Çima? Na.. heval ez nayêm Sakramento, ez ne poşman im, Na... tişte me ji zarokiyê bi hev re dest pê kir, em berdewam nakin:

Ew hestê şelû yê dilê te vegirî, dema te ji Xezze bar dikir; ew hestê piçûk, divê wek dêwekî di hinavêne te de serê xwe rake, divê mezin bibe, divê tu li pey bigerî da ku tu ... li vir di nav şûnwarêñ revîna kirêt de xwe bibînî.


Ez nayêm ba te...lê tu vegere, ba me... vegere.. da ku ji piyê Nadiyayê yê ji serê ranî hatî birrîn, tama jiyanê bizanî û bizanî bihayê hebûnê ci ye û çiqas e...

Heval vegere... em gişt li ben-da te ne.....

1) Bajarek Filîstinê

Nameyek ji Xezzeyê

Xesan Kenefani
Ji Erebî wergerandin:
IMAD CEMİL



Xesan Kenefani

Çiroknivisê bi nav û deng yê Filistînî, Xesan Kenefani di sala 1936'an de ji dayîk bûye. Di sala 1972'an de otomobîla wî ji alî nûkeren Îsraîliyan ve hat bombe-kirin û ew şehîd ket. Heta şehîdbûna xwe Xesan Kenefani di rojname û kovarê (El Hurriye), (Filistîn Sewra), (El-Envar) û (El- Hedef) de redaktori kir. Di jîyana xwe ya kin de X. Kenefani çar komên kurteçirok, çar roman, çar lêkolîn û bê hejmar meqalîn cûr be cûr nivisi.

jîyana min ya li vir mîna şeytanokeke piçûk a deryayê, vala bû. Di tenaiyek pîr giran de windabûnek. Ji hevrevandinek hêdi, di gel paşerojek mijgirtî, wek destpêka şevê, raborandinek genî û xebatek berdewam di gel çaxî, her tişt nûsek û germ bû, jîyana min ji gişt teyîsok bû, tev hêvi û daxwazîn jîyana min dawîya mehî bû!

Li nîv salê, wê salê, a ku Cu-huyan li bajarê "El-Sebhe" xist û Xezze, Xezzaya me, da ber agir û bombayan, dibû ku vê bûyerê tiştek ji jîyana min a rojane bi-guhure, lê min gelek pûte pê ne-ki.

Mane ez diçim Kaliforniyayê, ji xwe re dijîm û Xezzê li paş xwe dihîlîm, piştî wan nexweşiyê dirêj, min Xezze û ew kesen li Xezzeyê nevîn; her tişt li vî welatê bi tene mayî, tabloy-ên kirê yê mirovekî nexweş, bi rengê kulîkî nexîşandî, tîne bîra min, erê min pere ji diya xwe, ji jînbira xwe û ji zarokên wê re dişandin, perekî kêm ku hema bi-karin deba xwe pê bikin, lê ez dê ji vî tayê derziyê ya dawiyê jî-rizgar bim, li wir, li Kaliforniya kesk, a dûr ji bêhna revînê ya ku eve serê heft salan e ku, kepiyê (pozê) min pîr bêhnî dike. Ew dilpêşewitîna min bo zarokên bî-rayê min û diya wan û diya min, nabe ku bibe sedema berde-wambûna karesata min bi vî awayê rast û rast, nabe ku min

venakolin, ta ku me'na wê ya bi duristî eşkere dibe, çima em vê revînê bi birînen wê ve nahêlin û naçin ber bi jîyaneke rengîntir û kûrtir û xweştir... Çima?

Bi duristî me nedîzanî! Dema meha Hezîranê min îzna xwe girt, min hemû tişten xwe kom kirin, ji bo xwe havêtîna şîrîn, ber bi van tişten hûr yê ramanek xweş û rengîn didin jîyanê. Xezze her Xezzeyâ berê bû, wek şeytanokeke jengî der-girtî û pêçayî, pêlan xwe havêtine ber kenarê avê yê nûsek.

Ev Xezze ye; tengtir e ji henaguya raketiyeke ku kabûsekî bi tirs hatiyê. Bi kolankên xwe yê teng û bêhneke taybetî hêyî: bêhna revîn û hejariyê. Ev e Xezze, lê ev ci tişt in ên ku ron nebin, yan ji mirov nikare ron bike û bêxe nav tuxûbêñ wan, ew tişten ku mirovî dikşînin ber bi mal, kesûkar, xanî û bîrhatînîn wî, çawa mîrgek, kerîyekî pêzkûviyan dikşîne ber bi xwe, nizanîm! Tişte ez dizanim wê sibê ez çum malê, ba diya xwe, dema ez gehîştîm, jînbira min a jînbî pêşwaziya min kir û bi kelegirî ji min xwest ku ez daxwaza Nadiyayê, keça wê ya birîndar ku ketiye nexweşxanê, bi cih bînim û wê évariye serî bîdimê, tu Nadiyayê nas dikî; bîraziya min a ciwan, a sêzde salî?

Wê êvarê min du-sê kilo sêv kirîn û berê xwe da nexweşxanê, da serî bidim Nadiyayê. Min hest

bîbûm ku hez ji gişt zarokan bikim, yê ku şîrê revîn û derbede-riyê mîjî, ta ku êdî jîyana xweş û bextewer jê re dibe tiştek seyr û lihevnehatî.

Li wê seetê ci rû da? Nizanîm! Ez çum hundir...odeya spî bê-deng, zarokek dema nexweş di-keve, rengê pîroziyê distîne, içar çawa ye eger zarok bi birîneke kûr birîndar be? Nadiya li ser textê xwe razayî bû, pişta xwe dabû balgeha spî, porê wê li ser belav bûbû, wek kurkekî gi-ranbûha. Bêdengiyek kûr di çavên wê yê mezin de hebû û rondikev di bîbîka reşa dûr de bû, dêmî, wê rawestayî û bêdeng bû. Lê ne-penîbêj bû, mîna dêmî pêxem-be-rek azardayî. Nadiya hîn zarok e, belê diyar dibe ku ji zarokekî pitir e, erê ji zarokekî gelek pitir û mezintir e, gelek mezintir...

- Nadiya....

Ez nizanîm ez bûm, min gazî kir, yan ji mirovekî din bû li pişt min, lê wê serê xwe rakir û li min mîze kir, min hîzir kir ku çavên wê yê min dibişîvin; mîna pirtikek şekirê ku ketiye qedeheke çaya kîyayî. Di gel bişkûrîna wê ya sivik, min dengê wê bihîst:

- Mam.... tu ji Kuveytê hatî?

Dengê wê di gewriya wê de şikest, desten xwe dan ber xwe, xwe piçek bilind kir û stûyê xwe ber bi min ve dirêj kir, min destê xwe bi serî de anî û li teniştâ wê rûniştîm:

Li ser yekîti û hevkariyê

R. Rûbar

Ji bo me Kurdan di roja iro de ji yekîti û hevkariyê giranbûhatir û bi qîmettir tiştek nîne. Ji ber ku tu wenatek bêyi vê negîhiştiye armanca xwe û bêyi vê tu netewe ji alî azadî û serfiraziyê de bi ser neketiye.

Wexta em li dîroka miletan dinêrin berî ku şertên şoreşê pêk bêñ, rîxistin û partiyê wan welatan bi ser û canê xwe xebitîne yekîti û hevkari çêkirine.

Gelo ji ber ci ew welatênu ku şoreş dabûne pêsiya xwe, kâribûn yekîti û hevkariyê çêkin û bi wasita van yekîti û hevkariyan bi ser kevin, welatê xwe azad bikin û bibin endamekî Koma Miletan û em ji vi tişte bê par bimînin.

Berî ku ez bersîva vê pirsê bidim, dixwazim hinek li ser hevkariyê me ku heta nuha hatine çêkirin bisekinim. Di sala 1979'an de li Kurdistana Tirkîyê bi navê UDG hevkariyek di navbera Pêşeng, Riya Azadî û KUK'ê de hat çêkirin. Vê hevkariyê tu berhem nedâ û di demek kurt de belav bû. Ji bona hin sebebêñ pûç xebata salan ji bona avakirina hevka-

riyekê bi avê de çû. Piştî cûntayê di navbera 6 hêzên Tirkîyê û Kurdistana Tirkîyê de bi navê "Yekîtiya Çep" hevkariyek çêbû. Em dev ji berhemê wê berdin, ev hevkari kinga hat avakirin û ji ber ci, kîngâ û çîma xerab bû em nizanîn. Û niha ji bi navê TEVGER'ê hevkariyek din di nav heşt hêzên Kurdistana Tirkîyê de hatiye avakirin. Berî her tişti ez dixwazim bidim diyar kirin ku, ez bi dil û can bi mal û bi her tişte xwe ve amade me ku piştgiriya vê hevkariyê bikim û hêviya min ev e ku ew biserkevin û bi milyona welatparêz û dilsozen wek min li dû wan bimeşin û daxwaziya min ev e ku ew bibin serkêş û rîberen şoreşa gel.

Lê bawer nakim ku TEVGER ji ji UDG'ê û SOL BIRLIK'ê cûda be. Meseleyek Kurdî heye: "Ji pîrî pirsîne, gotine tu ci dixwazî? Gotiye piyêñ xurt û ronîya çavan." Bi bîr û baweriya min kîngâ meriv şoreşa Kurdistanê bi ser hemû tişti re girt û kîngâ meriv ji bona azadî û serxwebûna Kurdistanê her tiş fedâ kir û çaxa meriv menfaeta şoreşê ji menfaetên xwe yên şexsî û rîxistinî girt pêş, wê gavê wê yekîti û hevkari

bi bingeh bin û xurt bin û hevkariyê me ji wê bibin wek evê cihanê. Û ewê wê gavê valabûnê tiji bikin û yêñ bibin rîber ji bo têkoşîna gel û gel bibin serfiraziyê.

Bi dîtina min hevkariya TEVGER'ê ne li ser esasekî bingehî ye. Ji ber ku endamên rîxistinê ku di TEVGER'ê de cî stendine, nêrîna grûbiya teng ji ser xwe neavêtine. Wexta Sol BIRLIK hebû rojnama Sol Birlik mehê careke derdiket. Û wexta meriv li Armancê, Komkarê, Pêşengê, Riya Azadî û Yekîtiya Sosyalist dinêre navarokêwan ne qels in. Li hember wan naveroka rojnama TEVGER'ê gelek qels e û ji du mehan carekê derdikeve. Ev ji tê wê manê ku tesîra nêrînen grûbî hîn li ser endaman pirr xurt e. Yanî bi dîtina min çiqas nêrînen teng yêñ grûbî kêm bibin wê ewqas hevkari û yekîti ji xurt bibin. Ez dixwazim nivîsa xwe bi gotînen Mesût Barzanî dawî bînim. Mesût Barzanî wiha digot: "Eger ev cepha me ya nuha heye, di destpêka şerî Iran û Iraqê de hebûya rewşa gelê me û rîxistinê me wê iro ne weha bûya."

Kongra Duyem a Yekîtiya Nivîskarêñ Kurd

Yekîtiya Nivîskarêñ Kurd li Swêdê (YNK) kongra xwe ya duyem di 5'ê Gulanê de li Stockholmê çê kir. YNK salek berê li Swêdê ji alî nivîskarêñ Kurd ên ku li surgûnê ne hat damezirandin û ji hemû perçen Kurdistanê nivîskar endamên wê ne. Kongre, bi 21 endaman vebû. Komîta Karkir rapora xebata salekê pêşkêşî kongrê kir. Hin nûneran gazin ji sistiya Komîta Karkir kirin, di hin nuxtan de rexne li rapora xebatê girtin. Komîta Karkir bi xwe ji bi gelek rexneyî re bû û ji xwe kêm zêde ew kêmastyen ku endaman rexna dikirin di raporê de ji

hatibûn qebûlkirin.

Kongrê, li gel gelek bîryarı, bîryar girt ku girtina dostê Kurd û hêja Sosyolog İsmail Beşikçi bi protestonameyek ji Serokwezîr û Serokkomarê Tirkîyê re bête protesto kîrin. Û li ali din, ji PEN'ê û Sendika Nivîskarêñ Tirkîyê ji daxwaz bête kirin ku ew him alîkariya xwe bi Beşikçi re nîşan bidin û him ji vê bêqanûni û zorbatiya dewleta Tirkîyê protesto bikin.

Kongrê, her wîsa piştgiriya xwe bi nivîskarê Iraqî, Hadi E'lêwi re ji nîşan da; ku ew ji dostekî gelê Kurd e û nûha li derî Iraqê diji.

Kongrê, ji Komîta Karkir re van kesen jîrîn hilbijartin: Şerko Bîkes, Xebat Arif, Mehmed Uzun, Mehmed Seid, Cemşid Heyderî, Refîk Sebir û Rohat.

Prof. Hecîyê Cindî wefat...

Prof. Hecîyê Cindî, di sala 1933'î de li Uniwersîta Erîwanê beşê edeb û ziman qedand. Ew, di navbera salen 1936-1959'an de li Înstituya Literatûri ya Akademîya Ilmî ya Ermenistanê xebitî û di eyñî wextê de mamostetiya zimanê Kurdî kir. Ew, di sala 1966'a de bû profesor. Wi, bi munasebeta 70 saliya xwe mîdelîya dostaniya navbera miletan sitend.

Hecîyê Cindî di navbera salen 1955 û 1957'an de berpirsiyariya rojnama "Riya Taze" û demeke dirêj ji(1932-1966) berpirsiyare Beşa Nivîskarêñ Kurdî bû.

Li Sovyetê, di gîhandina mamostan û amedekirina kitêbên mekteban de ked û xîzmeta mamoste Hecîyê Cindî hêjayî pesnî ye.

Mamoste Hecîyê Cindî, di jîyana xwe ya 82 salan de bi xebata xwe ya ilmî re, ji bo nasandina kultur û edebiyata gelê xwe bi gelê Sovyet, xebatek bêhempa kir. Wi, ji alîki ve bi cildan berhemê folklorik ji nav gel da hev, ev xezîna mîli ji wendabûnê xelas kir, li ser wan lê kolînîn ilmî çê kir, kîritikên hêja nîvisand, ji alîyê din ve ji bi riya wer-

gerandina kitêban û nîvisandina meqalan kultur, edebiyat û folklora Kurdi bi gelên Rûs, Êrmenî û yêñ din da naskirin.

Gelê Kurd wê vê xizmet û xebata mamoste Hecî tu carî ji bîr neke. Her Kurdeki şîrhalal, welatperwer wê tim û tim navê mamoste Hecî bi hezkirinek kûr û bi humretet mezîn bi bîr bîne, bînitirine.

Ji eserên Hecîyê Cindî hînek ev in:

- Çirokén Kurdi -1940
- Folklora Kurdi- 1947
- Kerr û Kulika Silêman Selî, 1941
- Akademik Mar û Kurdnasî-1948
- Folklora Kurdi - 1952
- Destana Korogli (waryantê Kurdi) 1953
- Edebîyata Kurdi li Ermenistana Sovyeti-1954
- Mem û Zin -1956
- Mecmûayak ji Folklora Kurdi- 1956
- Rengvedana Dostaniya Ermenî û Kur dan di Folklorê de - 1965
- Romana "Hawari" - 1966
- Efsana Mili a Kurdi- 1969
- Rustemê Zal, 1977
- Meselok û Xeberokêñ Kurdan-1985

Ji bili van berheman, Hecîyê Cindî bi se dan meqale û lêkolîn nîvisiye.

Hindîk-Rindîk

Nîzanîbûye ku hatiye wenatekî din

Sevekê dereng zîla telefona Konslosxana Tirk a Kopenhagê lê dixe. Yê telefon dike yekî Danîmarkî ye, ji konslos re weha dibêje:

- Li vir, li istasyonê wenatekî we heye; li van derana di gere, pel-pel li dora xwe mîze dike. Ez fikrim min got dibê ku alîkariyek we karibe bigihîj, lema telefonî we dikim. Wiha dibêje û telefonê dide destê ye Tirk:

Yê Tirk:

- Keko vira ku der e?

- Kopenhag el

- Kopa ci ?

- Ne kop birayê min, Kopenhag ! Paytexta Danîmarka!

- Maka q?

- Birayê eziz, Danîmarka Danîmarka! Te dî gava meriv bi tirêne ji Almanya derbas dibê, wenatekî din tê, jê re dibêjin Danîmarka, a nuha tu li wira yi...

- Yanî nuha min Almanya derbas kirye ha ?

- Helbet te derbas kirye, tu hatîyi Danîmarka yê.

- Hela hela, min nîzanîbûku ez hatîme wenatekî din yaho! Ezê li wir dakte ma...

Di bin DDKD de ci heye

Pîşî derba eskerî ya 12'ê İlonê li Diyarbekrê pûlis dilsozeki DDKD (Komîla Kulturi ya Soreşger Demokratik) digre. Xort, ne yekî şit e, saf e. DDKD'ê ji pirr ji néz ve nas nake. Pûlis bi hawaki zalîmi li xort dixin, dibêjin, "hutîl batîl" tu yê ji me re bîbêji "di bin DDKD de ci heye?"

Xort baş dide bîra xwe, gelo "di bin DDKD'ê de ci heye?" Dûre tê bîra wî û dibêje, "li min mexin, ezê bîbêjim di bin DDKD'ê de ci heye. Di bin DDKD'ê de ezexane û aşxane heye."

Li ser vê bersîva lêwik, pûlis bêtir hêrs dibin, dibêjin:

- Law em wiya napisin, em dibêjin yanî li paş DDKD ki heye, tu wiya ji me re bîbêje.

Li ser vê xort dibêje:

- Haha, nuha min fahm kir. Li paş wê Camiya Pêxember heye.

Amadekar: Zinarê Xamo

Li Midyadê cînayeta...

Wexta ev bûyer dibûn, di Mahkema Ewlekarîya Dewletê a Diyarbekrî de ji mahkem 155 Cizîriyan dest pê kiribû. Di navbera wan de lawikekî 14 salî ji hebû. Li gor mahkemê êdî kesen 14 salî ji "serî hilda bûn", meşen bê qanûnî kiribûn, zerar dabûn avayıyê dewletê û ji bo vê ji 10 sal ceza dixwestin. İnsanên Cizîri û mahkemê de ji "iddiâyîn" sêvcî û hêkim qebûl nekirin, kirinê ku "Tîma Xusûsî" li Cizîre kiribûn eşkere kirin û bi Kurdî axaftin. Cizîri û mahkemê de ji ne tenê bûn. 15 Awûqatên Baroya Diyarbekrî, 2 Awûqatên Baroya Mîrdînê û 19 Awûqatên Baroya Anqerê ew parastin. Awûqatan di para-

stina Cizîriyan de li ser tarîx ûrewşa xusîsiyeta Cizîre sekînî û tişten ku "Tîma Xusûsî" li Cizîre kiribû, anîn zîmîn.

"Waliyê Kurdistanê" bi resmî li Kurdistanê boykot, grew, dikan girtin qedexe kir. Di 18'ê Gulanê de ji Stenbolê 21 berpirsiyare û xebatkarêñ kovarêñ pêşverû û sosyalist ji alî polisan ve hatin girtin.

Pîşî derketina "gerarnama di hukmê qanûnê de" serokêñ Partiyê Muxalfeta Tirkîyê Suleyman Demîrel û Erdal İnonû derketin sefera Kurdistanê. İnonû çû kîjan bajar, qeza û gundê Kurdistanê ji alî xelkê ve bi tundi hat protesto kirin. Partiya Pêşeng bi

belavokekê durûtiya İnonû anî zîmîn û bangî xelkê kir ku kes nece mitingên wî. Di dawiya gera xwe de E. İnonû ji rastî qebûl kir û got ku "Baweriya gelê Kurd bi dewletê nemaye, eger Serokwezîr vê rastiyê qebûl nake, bila bê bi çavê serê xwe vê rewşê bibîne."

◆ Grewê Birçibûnê

Di 24'ê Gulanê de wexta rojname ket çapê, 600 girtiyen hefsa Diyarbekrî ji bo başkirina rewşa hefsê û protestokirina "Qerarnama 413" ketin grawa birçibûnê. Girtiyen hefsa Mîrdînê, Meletiyayê, Eskişehîrê, Aydin, Nazîlî, Ceyhanê, Bismîlê û Bûca yê ji disa ji bo sebebên jorîn ketin grawe. Ji bo piştgiriya girtiyen 500 kes ji di bînaya Partiya Sosyalist a Diyarbekir de dest bi grawe kirin. Ji wan 100 kes jin bûn. Di 25'ê Gulanê de polis êris bir ser bîneya Partiya Sosyalist, 15 kesen ku di grawe de bûn birîndar kirin û 300 kes ji girtin. Ji alî din 8 girtiyen siyasi yê hefsa Çanaqelê (ku 5 ji wan berpirsiyare kovaran û 3 kes ji sendikavîn) ji bo rakirina Xalîn 141, 142 û 163'ê di 15 Gulanê de dest bi grawa birçibûnê kirin. Wek tê zanîn Berpirsiyare TBKP Nîhat Sargin û Haydar Kutlu çendakî berê di wan Xalan de habîbûn berdan.

BAWO KA TI DEYNÊ MÎ NÊDANÎ ?

H. Diljen

Roşna û pêrdê xo ya şî dûkanî ser. Kêberdê dûkanî ver o 'erebekêda çî girewti û şî zere. Dûkan zaf gird bî. To çîçî biwaşte te de estbî.

Verî shit û mast kerdi 'erebekî miyan. Dim a 'erebekî leyr kerdi û hetê meywî ya şî. Engûri, say, porteqalî, miroj, mandalîn zî kerdi 'erebekî miyan. Labelê çimê Roşna tim hetê şekerî û dondirmî ya bî. Pêrdê xo rê va:

-Bawo, qey ma do dondirme û şeker zî nêherînê?

Piyê ci va:

-Ki perey ma bes bê ma do biherînê.

Piyê Roşna çimê xo çî ser ra çarnay, vayîya ci xo heti hesab kerdi. Dim a zî cizdanê xo, xo tûniki ra vet û perey xo hûmarîfî (amordî). Fina ewnîriya çidê 'erebekî ra, verê xo heiê Roşna ya kerd û va:

-Keyna min, perey ma tenya qîmê nê çiyan kenê. Ez to rê dondirme û şeker rojna herînena.

Roşna va:

-Perey ma çend kemî yê?

Piyê ci va:

-Bi texmîndê min des panqinotî kemî yê.

Roşna va:

-Ê des panqinotê ki to a roji day min, hewna min dir ê. Ki ti vanê ez eynan dana to.

Piyê ci va:

-Beno keyna min.

Roşna û pîyê xo hetê cadê şekerî ya agê-ray. Roşna xo rê şekerî miyan ra çend babêti weçinay (vîjnay) û bi çemçik a kerdi pêlekê naylonînî miyan, dim a zî dondirme yê girewti û kerd çidê 'erebekî miyan.

Pî û keyna şî qasa ver o kewti sira. Verê qasa di şar zaf bî. Sira amê eynan. Kişîtê ra Roşna û kişît bîni ra zî pîyê ci çiyê xo jew bi jew 'erebekî ra veti û cinêkida qasdarî ver o rêz kerdi.

Cinêki çiyê eynan heme hesab kerd û fiyetê ci pêrdê Roşna rê va. Perey pêrdê Roşna bes nêbî. Xo ra Roşna des panqinotê xo xo tûnik ra vetê, day pêrdê xo. Ey zî des panqinotê ay nay perandê xo ser û day cinêkeri. Cinêkeri perey fina hûmarîfî. Çend qurişê ki perandê eynan ra mendibî hetê pêrdê Roşna ya derg kerdi labelê Roşna verê pêrdê xo destê xo derg kerdi û

perey girewti.

Roşna û pîyê xo çiyê xo dekerd pêlekânê naylonînî miyan û verê xo da keye. Ay heta keye dondirmeyê xo alist.

Nabêr ra di rojî ravêrdibî. Piyê Roşna kar ra amebî, xo qoltuxan ser o derg kerdi û hem gazete wendê, hem zî arisaynê. Roşna hetê ci ya vazday, va:

-Bawo, ka ti peranê min nêdanî?

Piyê ci va:

-Pereyê çîçî keyna min?

-Pereyê ki to min ra deyn kerdi.

Piyê ci hiwa, va:

-Deynê çîçî, keyna min?

-Ma nîno to virî? Ma şî dûkanî ser, ma çî herîna. Perey kemî vejjiyay. Min des panqinotî day to.

Piyê ci sereyê xo, xo ver na, keserê anti. Gazeteyê xo, xo ver di rona, werişt Roşna kerdi xo virari. Destê xo pordê ciyo derg û kejî miyan ra çarna, va:

-Keyna mina delali, ma nabêndê min û to di deyn û deyndar beno? Ma o çî kî rî herîna? Çiyê ma pê ra barakerde niyo keja min, ma keyeyenê ê. Perey ma zî, çiyê ma yo bîn zî ê ma hemîn o. Keyeyê miyan di deyn û deyndarey nêbenê. Hele nabêndê maypi û qeçan di bin ra nêbenê.

-Qisûrdê min meewnîrî bawo, min nêzana.

Roşna, zey pisînga ki shit birijno, şermayê. Ewnîriyay (Winiyay) xo ver ra. Vîstekê bêveng mendi. Dim a sereyê xo berz kerd, ewnîriyê pêrdê xo ra û hima nişka ve ra xo eşt ci virari. Çimê xo girewti û her di baskê xo pişti vîyedê ci ra, lewê xo gumda (alışkâ) ci ya pêt dewisnay. Sereyê xo hewa da, va:

-Qisûr meewnîrî bawo, min nêzana.

Piyê ci bi peşmiriyayış ewnîriya ci ra, va:

-Çiyê nebeno keyna min. Xo ra to bizanayê to nêvâtê.

Peşmiriyayışê pêrdê ci, pirûznayışê Roşna vinî kerd û ay bi kîfdê piya wereyamîyayışî ya lotikî day xo ro, şî teber ki kay bikero.

Vîstna tepiya amê zere. Hewna solê xo nêvetêbi, sereyê xo kîberdê (berdê) odî ra derg kerd û pêrdê xo rê va:

-Deynê mi to ya çîniyo labelê meşti mi rî şeker biya.

ZEKİYEYA ŞEHİDİ

Koyo Berz

Berê karwandê şehîdandê ma miyan resnê.

Biyarê, biyarê, çimsiyaya Dêrsimî biyarê!

Destanê ci berê destandê şehîdanê bînan resnê.

Adîrê Newrozî newe ra pa gurr kerê. Çemberanê eskerdê Romî tîtevrî vila kerê.

Xopananê Diyarbekirî newe ra roşn kerê.

Biyarê, biyarê, xezala Dêrsimî biyarê! Vilikandê azadî ya wêş wêş bixemilnê.

Biyarê cêr ra cor alda ma Kurdan ra pêşê.

Berê koyandê Dêrsimî ser o denişnê.

Biyarê, biyarê, veyya Dêrsimî biyarê*.

8-4-199

* Na şuri, qandê şehîda Kurdistanî, Zekîye Alkani ameşa nuştu. Zekîye Alkani semedê pirozkerdena Newrozî, 21'ê menga Adara 1990 di Diyarbekir di xo veşna, 29'ê menga Adara 1990 di jî şî rehmet û şehîd bî. Zekîye delali tim û tim do vîrdê ma di bo û zerîda ma di bo.

TEVGERA RIZGARIYA KURDISTAN (TEVGER)

-II-

Hedefê Politiki:

-Wedardena hukmê kolonyalizma Tirk û destdawoxonê dêy, sazkerdena Cumhuriyeta Kurdistan serbixo û demokratik.

-Bi destê hêzonê netewiyû û demokratik têşkilkerdena hokmatêki ravêraye û qanunê esasiya Cumhuriyeta Kurdistan hazırkerdene.

-Heqa qanûnvetene, parlamentoye Kurdistanîyo millîyo ke eve (bi) hilbijartîn (seçim)eki umumi, têdustayı, dizdiyayı û zuderecayı ra amo werte, dêy dayêne; heqa karhurêndardene, hokmato ke bi destê na parlamento amo sazkerdena, dêy dayêne; sava hûrêndardena edaleti ki sazkerdena mahkemonê serbixo û demokratik.

-Bijartînên û vezife ra guretena mesulonê mahalli (belêda û iyê bîn) bi destê xelk ra bêro kerdene.

-Kesê ke kunê des û heyşt sere, sava dîne heqa rîydayêne, iyê ke kunê 21 sere, dîne rî ki heqa seçim kewtene (endamên)

-Herkês rî serbestêna fikir, qeseykerdena (xo ifadekerdena), çapkerdena, rîexistin sazkerdena, pêseramayêne (kombayêne), xo nîsandayêne, qedexekerdena (ya-saq) rasistên û fasistên.

-Zorbazêna ke eqalîyetonê millîyan Kurdistan (Erev, Hermenî, Çerkez, Suryanî û iyê bîn) ser o wa, wedardena daye; heqa millî û demokratik dîne dayêne û lewê nayine de heqa millî û demokratik a Tirk û Azeriyû rî ki hurmetkerdena; sava zon û kultûre xo serbest avêberdene, cawo ke nê eqalîyet te de zêder ê (ekseriyet ê) heqa otonomiya mintiqayî dîne dayêne.

-Çiqas imtiyaz û zorbazêna ke hetê dîn û mesevû ra esta, wedardena daye; sava herkes iمانkerdena (bawermendên) temami ya ser prensibonê laikê.

-Zilm û heqareto ke cênyû ser o wo, wedardena dêy, wertê cênyû û cwamêrdu de zêzuvînbayên vi-rastene.

-Vêzifê parêznayêna (muhabazkerdena) Cumhuriyet û şoreş, ordî û mîlis o ke binê kontrolê hokmatî der o dêy dayêne.

Politika Ekonomik û Sosyale:

-Muessessonê emperyalistû, kolonyalistû û destguretoxone dinû; bir, maden, gol, çem û dewlemediya tabiiya zê din a bîne; pangû (panqayan), şirketonê sîgorta, ticarêtê tevîr, radyo-TV, PTT, raya demiri (raya trêne), raya hard û müessessê bînê ke jiyanâ ci-vakî (heyata cemaati) de mûhîm ê, yinû milkê dewlete kerdene.

-Sazkerdena û avêberdene ekonomiya millî, verê her coy ki ye senayiyê giran; senayiyê qiskêk û ticarêt rî wayîrkerdene.

-Bi gîrêdayêna mînfatê millî û mînfatê her di hetû, gorê ehtiyaca ekonomiyê millî sermiya tevîr tîmîkerdene.

-Bi saya şoreşê hard ra dewizê ke bê milk ê, ya ki milkê xo senik o, yine wayîrê hard kerdene;

wayîrê hardê ke wela (hardê) xo zof a û hetê şoreş ki pê gureto, halê dîne çimû ver dayêne. iyê ke hetê dismîn gureto, dest ro hard û hacetonê dinonê kar ser nayêne.

-Kurdistan de bi şeklêki modern avêşayêna ziraat û weyi-kerdena hîywanû, bi destê dewlete rakerdena müessessonê cîte, sava kooperatifû de pêseramayêna dewizû gurenayis, hetê kredi, hacetonê teknikî û tedbirône binû ra ki têpa dest ra dîne dayêne. Muessesê dewletê ke werte ra darînê we û dînê dewizone feqirû û halwertû, dînê esnaf û senatkaronê ke dîne rî, pangû rî, axawû û tefeciyû rî esto, iptalkerdene dêy û sava vergî ardena sistemîki bi adalêt o ke halê gurenawoxû dano çimû ver.

-Ardena roza kar a 8 saatîye; gurenawoxû têdine rî naskerdena heqa sendikawa ke heqa grevî politik û umumi, pêserhurêmayis sava idarê hurênda kar a ke heq-dayêna karkerû te der a.

-Qedexekerdena lokavtî.

-Karo ke zê zuvîn o, sava dêy hondê zuvîn pere dayêne.

-Sava parêzendîna hemegê cênyû û domonû tedbiguretene.

-Xizmeta sihat sosyalkerdene û gurenawoxû rî bêperekerdene.

-Kokimû, seqetû, viyawû û sewû rî bi destê dewlete wayîrêvîjeyêne.

-Werte ra wedardena bêkarên (betâlên) rî tedbir guretene.

-Problemê xelki o ke hetê çewû ra esto, werte ra wedardena dêy.

Politika Wayîrê Hunerbayêne û Kultur:

-Resmikerdena zonê Kurdî.

-Sistema wayîrê hunerbayêna (wendene) ke rasist, şoven û asimilekerdox a, wedardena daye; ardena sistema wayîrê hunerbayîkî millî û demokratike, ca dayêna wayîrê hunerbayîya (wendene) esase; wayîrê hunerbayîya gencû û pilû rî tedbîrguretene; bêperekerdene karê wayîrê hunerbayênen, Kurdistan de sava avêşayêna kulturê millî, ilim û sînete, tedbirê ke lazim ê, guretena dîne.

Politika Tevîrî:

Ramitena politikayêki serbixo û bêtere, wedardena caronê eskerye xamû; dustê politika şer a emperyalistû, tizkerdena çekdarîn, kolonyalistên, faşistên û paşverûyên; qewetê dînyayê şer-nîwastoxû û demokrasi û sosyalizm rî, hereketonê xelesayêna millî rî dosten û pa karkerdene.

AR (Ala Rizgarî)

KUK-SE (Rizgarixwazên Netewî yîn Kurdistan -Baskê Sosyalist)

PARHEZ (Partiya Hêza Walet-parêza Kurdistan)

PDK-RN (Partiya Demokratî Kurdistan-Rêxistîna Netewî)

PPKK (Partiya Pêşeng a Karke-re Kurdistan)

PSKT (Partiya Sosyalist a Kurdistanîna Trîkiyê)

ŞK (Şoreşgerên Kurdistan)

YSK (Yekîtiya Sosyalist a Kurdistan)

"Heqaret"

Di hejmara Adarê ya rojnameyê de gotareke R. Qerecdaxî di der heqê min de hatiye weşandin. Ezê gelek spasdarî we bim, heke hûn bikaribin bi kerema xwe ev kurtenameya min di hejmara bê de bidin weşandin.

"Heqaret"

Birêzeki bi navê Reşoyê Qerecdaxî di derheqê min de nivîsarek nivîsandiye (Armanc: Adar, 1990). Ez wî birêzî nedinasim, lê nivîsara wî xuya dike, ku ew li dij min tiji gîr "xezeb" e.

Ne ji sinçiyên min e, ku ez di der heqê nivîskarêne Kurd de, siyaseta wan ci dibe ji, tiştên wek birêz Qerecdaxî nivîsandiye, binivîsînim. Hêvîdar im, xwendevanê Armancê bikaribin nameya min û nivîsara birêz Qerecdaxî bidin hember hev, bo bi xwe bîryara xwe bidin, ka "heqaret" ci xwebêjê dide. Heke birêz Qerecdaxî ji bo Çawîsesko weqa xeyidiye, bila girra xwe raste rast bibira ser gelê Romanya.


Nivîsaren wisa tu sûdê nagîhîn keseke. Rexne li ser ser û çavan, lê şerm e mirov weqa dilreşî bi şeweke "sûbjektîv" têxe rîzan.

30. 04. 90.

Şahînê Bekirê Soreklî
Awîstralya

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1- a: Bajarek li Kurdistana Tirkîyê ku bi serhildanê xwe yên li dij Împaratoriya Osmanî û Cumhûriyeta Tirk hatiye nasin. b- paqikirina giyayê biyanî, yên li zeviyan, bexçeyan şîn dibin. 2- a- Di kurmancî de pronavekî kesin. b- ar, ard. 3- a- Cihê xopan, kavil. b- Bi soranî "êvar". 4- a- Kesê ku ci caran bi politikayê bilî nebe, kesê ji politikayê hatiye dûrxistin. 5- a- Ax. b- Heywanekî kûvî. c- Di kurmancî de ji bo tişt û kesen nêzîk û teyîdkirî pronavekî îşarkî. 6- a- Ava ku naherike, ava ku sekîn ye. b- Du herfîn bêdeng. 7- a- Navekî kur'an (berevajî). b- hîc, ebeden, qet. c- Pronavekî pirsê (berevajî). 8- a- Kurtiya "number, nummer". b- Aletekî müsiqê ku geleb stranbêjîn kurd lê dixin (berevajî). c- dûman, dûxan. 9- Bi zimanî "osmani" pere çap kirin. b- Tiryî hîşkirî. 10- a- Pronavekî îşarkî ji bo kes û tiştîn nêr, ên nêzîk. b- Peyveke dema mirov dêse, yan li hember tiştîkî şas dimîne, dibêje. c- erd, yan dar, yan giyayê bê av, bejî

(berevajî) 11- a- Belgeya ku mirov pê ji sînoran derbas dibe. b- Heywanekî bi hêz (berevajî) 12- a- Esman, "ezman". b- navê darekî (berevajî). c- kok, rîh, rîşal.

Serejêr: 1- a- Kesê zengîn, kesê pir pere, mal û milkê wî hebe. b- Birayê babê meriv, mam (berevajî) 2- a- Dema dilê meriv bi

Bersîva hejmara 103'an

Çeperast: 1-a)Cizîra Botan. 2-a)ed. b) rêvin. c)lik. 3-a) berav. b) zava. 4-a) aramî. b) erînî. 5-a) dêr. b) ne. 6-a) ev. b) şebnem. 7-a) tinaz. b) acve. 8-a)no. b) Sîn. c) ig. 9-a) ag. b) bapêş. 10-a) se. b) aborî. 11-a) ib. b) rîşî. c) eya. 12-a) ramûsan. b) şane.

Serejêr: 1-a) Celadet. b) afir. 2-a) id. b) rêving. c) ba. 3-a) bar. b) no. 4-a) irem. b) şâ. c) berû. 5-a) rîri. b) êzva. c) is. 6-a) ava. b) ob. c) paşa. 7-a) bive. b) Nisêbin. 8-a) on. b) iço. 9-a) zizman. b) reş. 10-a) alan. b) çiya. 11-a) nivîn. b) vî. c) an. 12-a) ka. b) Elegaz

Not:

Di xaçepîrsa hejmara berê de her du rîzîn pêşî yên "Serejêr" bi çewti di şuna hevdû de hatine rîzî kirin. Em daxwaza lêbûrînê ji xwendevanê xwe dikin

Xelata BERBANG'ê

Ji bo çîrok û helbestêne Kurdi

Berbang, kovara Federasyona Komelen Kurdistanê li Swêde, pêşbirkeke ji bo çîrok û helbestêne Kurdi(ji hemû zaravan) li dar dixe û wê ji isal pêve ji bo çîrok û helbestêne Kurdi xelatan belav bike.

▲ Navê xelate, "Xelata Berbangê" ye.

▲ Hemû Kurden li welet û li derveyî welet, dikarin besdariya vê pêşbirke bikin.

▲ Ji bo Xelata Berbangê, ji hemû zaravên Kurdi, çîrok û helbestêne yekern wê bîn hilbijartîn. Qînetâ xelate ji bo Çîrok û helbestêne yekem 5000 Kronê Swêde ye.

▲ Hemû Çîrok û helbestêne hêja wê weki pirtûkeke bîn weşandin.

▲ Hevalen ku dixwazin di vê pêşbirke de besdar bibin, dîvê berhemênen xwe heta roja 31. 10 1990'i bigîhîn adresa Berbangê. Berehemênen ku dereng bigîhîn adresa Berbangê, besdar pêşbirke nabin. Ji bo tespitâ wextê muhura postê muteber e.

Sertêne(mercen) Beşdarbûnê:

- 1- Endamên juriyê nikarin besdar pêşbirke(musabaqê) bibin.
- 2- Berhemên besdar dîvê li tu derê nehatibin weşandin.
- 3- Şair an niviskare/niviskara çîrokê dîvê di binê berhemâ xwe de navê xwe ye rasti nenivîse, lê dîvê naznavekî binivîsine. Bo nimûne: Şüna Mehmet Uzun, dîvê Rûges bête nivîsandin. Navê rasti tevi navnişana nivîskar di zerfeke devgirti û Berhemâ nivîskar di nav zerfeke din de, dîvê li ser adresa jîrîn bête şandin.

Navnîşana şandinê:

Xelata Berbangê
Box: 45 205
104 30 Stockholm / SWEDEN

4- Berhem li xwedî nayen vege randin.

5- Berhemên şandî, an bi daqtilo an ji bi destxeteke wisa ku herkes di xwendîna wê de bikaribe têbîghê. Berhemâ şandî ya ku neyete xwendîn, besdar musabeqe nabe.

6- Çîrok dîvê ji 30 rûpelê daqtiloye(A4) ne zede be.

7- Heryek dikare hemi ji bo besê çîrokê û hemi ji bo besê helbestê berhemekê bişine.

8- Xelata Musebaqê wê di roja 26.01. 1991'e de, bi şahî bê belavkîrin.

Naven endamên Juriya Musabeqe:

- 1- Sérko Békes
- 2- Hema Said Hesen
- 3- Cemşid Heyderi
- 4- Rojen Barnas
- 5- Mehmet Uzun
- 6- Mueyed Teyeb
- 7- Mustafa Duzgun
- 8- Malmisanij

Toximê nefretê ji zaroktiyê...

Li Diyarbekrê em rastî dukandareki ku alaqai wî bi siyasetê tunebû hatin, bi qasî "Ozel Timê", ewqasî ji ji PKK'ê ditirsiya.. Li alîdin ji ber ku wî di wan meselîn dawî de dikana xwe girtibû, loma ew bi gelek kesen din re, şev nîvê şevê ji mala wî birbûn û pênc rojan bê nabên îşkence pê kiribûn. Di dema îşkencê de çavên wî û yên din girê dabûn ji bo ku kesen îşkencê nas nekin.

Pirs: Tu sê heftan li Tirkîyê mayî û programek te ya tije hebû. Ji xeyni mesela siyasetê, tiştîkî ku tesir li ser de hişt, heye?

G. Wallraff: Di hinek pirsan de em dil rehet bûn. Me ji hefsiyan dipirsî yê ku pirr îşkence bûye kiye? Me dîqet kir ku girtiyen

dîtina min a Azîz Nesîn e ku ew yek ji wan kesan bû ku programa gera min hazir kiribû. Ew û Yaşar Kemal ji wan nivîskarênu iro li Tirkîyê ên heri bi qîmet in, eynî wek Henrich Böll ku demekê li Almanaya Rojhîlat ku bi serê xwe enstîtuyek moralî bû. Li mala wî hinek kes û hunermend dicivîyan û tiştîn ku di pirtûkên xwe de wek xewn dîdit, dixiste jiyanê.

Ezîz Nesîn çerçewa malbata xwe fireh kirîye. Li derveyî Stenbolê di baxçeyekî pirr mezin de weqfek çê kirîye û hinek zarokênu sêwî û pirr feqîr girtiyen ba xwe. Ew, wan ji jiyana berê a zehmet derdice, dide xwendîn, jiyane û malek xweş dide wan.

□

Mîrek li Taqeûsanê - li Loranî hebû, navê wî Xesro bû û kurekî wî hebû navê wî jî Şero bû. Jina Mîr miribû, wî û kurê xwe li koşkê li gel jinan kêt diki-rin. Şîrîn keçek Ermenî ye û ber-pirsiyara jinan bû. Ji ciwaniya wê şivanê rîbir şeyda(dîn) bûbû û gelel caran ew û çetên xwe ji bo dizitîyê diçûn koşkê û cihê dewle-mendan û wan para jar û hejaran jî didan. Ferhad kurê hakîmekî piçûk bû, wî neht û nexş dixwend û ji evîna Şîrînê dest ji karê xwe berda û bi arîkariya bavê xwe Şaporî, ew bi hev re diçûn koşkê û ji xwe re karekî dîtin. Û ji ci-waniya jinêñ koşkê Şaporî jina xwe berda. Dûmayî, Ferhad na-gîhîje armanca xwe û Şîrîn jî tola wî distîne û koşka mîr dibe do-jeh.

Ev destana han li çar deverên Kurdistanê belav bûye; Loristan, Mûkîriyan, Botan û Badînan. Û di şîrînê Kurdi yên klasikî û yên nuh de ji cihê xwe girtiye. Lê mixabin e ku naveroka wê baş ne hatiye parastin. Li Ewrûpayê kêmîtir 15 kes hene ku vê destanê dizanin. Dengbêjek li Swêdê heye ku dikare du seetan sitrana "Şîrîn û Ferhad" bistirê. Lê kes rê nadê, ji ber ku dê û bavê wî ne Misil-man in; pêşverû nayê qebûl kirin, dibêjin ku dengê wî ne xweş e.. Edî emê çi bikin heta ku folklor xwe biparêzin?! Divêt em li kaniyê bigerin, berî ku zuha bibe! Yanî divê bi çavekî bilind li folklorvanan bête nêrîn, çi Gulê be, yan Remo û Kawa bin. Em hemû Kurd in!!

Rojeke ji rojîn zivistanê Ferhâdê kurê hêkim û Şîrîna Ermenî li şahiyeke hev dibînin. Ferhad bê ku pê re biaxive hez jê dike. Care-kê Ferhad xewneke ecêb dibîne, ku ew û Şîrînê bi dilekî tijî evîn bi hev re dilizin. Dema Ferhad ji xewa şîrîn şiyar dibe hiş di serê wî de nemabû û dibêje:

Dermanê min e Şîrîna nazdar

Dûriya wê ez dîn kîrim ey hawar-Mamosteyê Ferhadî, Yakov gote dê û bavê:

Kurê we ji evîna Şîrîn
Bûye nexwêş, gêj û dîn
Ji wê xewnê bûye şeyda
Di serê wî de nemaye hiş û sewda
Bi Yezdan ger ne bînim Şîrînê
Dê bimrim ji xewna evînê
Ferhad im, ne sad im, bi xem û şîn
Dîn im, ne mîn im ji evîna Şîrîn.
Bavê Ferhad gote arîkariye xwe
Şaporî ku arîkariya kurê wî bike.
Rojeke ew û Ferhad diçine koşka Mîr Xesroyî, ew Mîrek ji mala Şahîn Kemerlalan e û li koşkê ji xwe re kar dibînin û roj bi roj nêzîkî Şîrînê dibin. Şîrînê ji rojekê di xewna xwe de Ferhad dibîne. Şîrînê ji nêzîkî Ferhad dibe û xewna xwe jê re dibêje. Wê gavev şîvan û çetên xwe nêzîkî koşkê dibin, jîn, xwarin û cilan didizin û şerekî mezin çêdibe. Ferhad birîndar dibe û pismîr(lawê mîr) Şero ji aliye çetên şîven ve tê girtin. Mîr çar zêra dide şîven ku kurê wî berde. Pişti rojekê pismîr Şero dizivire koşkê. Ferhad jî sê mehan nexwêş dikeve û nema kare kar bike. Hingê Şîrînê arîkariya wî dike û dema baş dibe, Ferhad dibêje;

Dîlberê nazenînê

Sûnd dixum bi navê evînê
Jîna te xweş bit û dilê te şad
Bila gorî te bit canê Ferhad

Şapûr: Şîrîn can Ferhad
Jî dîtina te şad

Di vê ahengê de her du evîndar

Destana Şîrîn û Ferhad

Berhevkirin:
Mixal Zaxoyî ji devê kek Hazîm Gûlî û
Xanîm Pîroz Bêzîhî girtiye û rast kiriye

biryara xwe didin ku bizewicin. Nobedarekî zikreş li wê derê bû û Ji Mîr re got;

Mîrê mezin şerm e ku tu Mîr û Ferhad şagirt e û Şîrîn ji xwe re birî

Mîr:

Ez Mîr im
Mirovîk jîr im
Ezê mala Ferhad bikime wêran
Ey nobedar can
Haha haha.....

Mîr got heger ku Ferhad çiyayê Bêstûnê bike behîşt û koşkeka mezin tê de ava bike, bila Şîrîn jê re be. Ferhad ji ber evîna Şîrînê qebûl kir. Rojekê Ferhad dest bi karê xwe dike û leşker û gundi jî aîkariyê dîkin. Èvarekê Şîrîn cû nik û di wê şevê de her du evîndar kîfa xwe dike heyâ hingûrê..

Ferhad: Lê lê cana min

Roniya jiyana min
Lê lê çavmestê
Xoşa min bi te tê
Lê lê Şîrînê
Tu rîka evînê
Lê lê delalê
Xoşa serê salê

Roja din Ferhad û Şîrîn ji xwe re diçine seyranê ber bi Ker-mensahê. Di rê de ji aliye çetên Şîvan ve tê girtin.

Şîvan: Şîrînê ez aşiqê bejna te me

Jî mîj ve li benda te me

Şîrînê Şîvan dixapîne û dibêje:

Jî eşqa te min Ferhad anî
Ku ji me re durist bike xanî
Û tê de bijîn û binoşin ji xweşiya canî.

Ew bi hev re dest bi keyfê dîkin û vedixun. Dema şîvan Şîrînê maç dike, Ferhad hêrs dibe û xencera xwe derdixe, şîven ji çar, pênc ciya birîndar dike û ew û Şîrînê ji wir direvin.

Şîrîn: Ferhado ey xortê Loristan
Bila gorî te bin hezar Şîrîn, aman

Ferhad: Xwe bilezîne Şîrîn
Divê em birevin
Ber bi Bestûnê biçin
Felek xaîn e, nahêlê em
bi hev re bijin..

Şîrîn û Ferhad dizivirin ciyê xwe. Rojeke Mîr Xesroyî û kurê xwe Şero diçin çiyayê Bestûnê û li karê Ferhad temaşe dîkin. Dibînin ku Ferhad baş kar dike û dê karê xwe tekûz bike. Mîr ji kurê xwe re dibêje;

Ferhad karê xwe kire hew
Lê bi çavê xwe nedît
Şîrîna bedew

Xelkê koşkê hemû qebûl kirin ji bili Şaporî. Di cih de Şaporî tête girtin, diavêjin hepsê û tê de tê kuştin.

Rojeke Mîr Xesroyî ji pîre-jinika xapînok re dibêje, ku tu rewşa Ferhêd xerab biki.

Dayê pîr, dil bi xem ê, hawar e,
Şîrînê di devê min de jehra mar e
Mîr ji cil û zér dide pîr û di-

bêje, ku tu bi gotina min bikî, tu ci bixwazî ezê dîsa bidim te..

Pîr: Ezê xwîna Ferhad bîrêjim
Û kelaxê wî ji Bêstûnê bavêjim

Pîrejina xapînok diçe çiyayê Bêstûnê û li wê mirina Şîrînê belav dike.

Pîr: Hey dad û bêdad
Kore bim Ferhad
Jaro Şîrîniya mirinê
Min ji te re anîye, ay li minê

Ferhad: Erê pîrê
Kî miriye lê
Xwedê neke
Ku Şîrîn be

Pîr: Xwelî li sero miriye Şîrîn
Îro ya bêdeng e, li bin zemîn

Ferhad têr li xwe dixe û birîndar dibe...

Ferhad: Ez çi bikim bê te Şîrînê
Ay ji derdê evînê
Erê pîrê
Kê te şandiye vê derê.

Gundiyeke zanibû ku pîrejina xapînok ji aliye Mîr ve hatiye şandin.

Gundi: Pira xapînok dibê tu bimri berî Ferhad
Û tu bi xelata Mîr ne bûyî şad

Ferhad ku kuştina pîrê bi çavê xwe dît, lê dereng zanî ku pîrejin xapînok e.

Ferhad: Aman, aman, aman
Jî dûriya Şîrînê bûme bê can
Eve gorî wê ye canê min
Lê felekê ay li min

Hingê Şîvan û çetên xwe nêzîkî koşkê dibin û şerekî mezin çêdibe. Her wisa Şîrînê ji zanibû ku Ferhad xwe kuştîye. Ew jî dikeve rê û dihere çiyayê Bêstûnê, ciyê karê Ferhad.

Ferhad:
Tu mayî, ev tu yî, aman
Ey qublegeha evîndar

Şîrîn:
Yaro te çîma wer li xwe kiriye
Te pîrsa min jî nekiriye.

Ferhad:
Dema minbihist navê mirina te
Li nik min yek bû, derew e yan rast e
Canê, li ser ranê te ye
Serê min
Ger bimrim jî dîsa xweş e mirin.

Şîrîn:
Ez gorî, Ferhad can
Çîma te ez kirime xemxwar û perişan
Ji ber min te xwe kuşt, hêviya jîn im
Bi Zerdeşî ne ma Xesroyî bibinim.

Gundi kelaxê Ferhad dişon û ji destmala Şîrînê kefenê wî çê-dîkin û li çiyayê Bêstûnê vedi-sîrin. Pişti mirina Ferhad pismîr Şerojî ji Şîrînê re dibêje;

Şîrîn: Ez gorî, Ferhad can
Çîma te ez kirime xemxwar û perişan
Ji ber min te xwe kuşt, hêviya jîn im
Bi Zerdeşî ne ma Xesroyî bibinim.

Gundi kelaxê Ferhad dişon û ji destmala Şîrînê kefenê wî çê-dîkin û li çiyayê Bêstûnê vedi-sîrin. Pişti mirina Ferhad pismîr Şerojî ji Şîrînê re dibêje;

Şîrîn: Şîrîna nazdar
Evîna xwe ji te re
dikim xuya û diyar

Şîrîn: Min sê şert hene ezbeni
Ji bo te me, ger wan bi
cih bînî
Ger bixwazî bi eşqa min
şad bîbî
A yekê divê babê
xwe bikuji
A diwê heyîna wî
bîkî wêran
A siyê pere û zêren wî
jî bide jaran
Hingê bi van biskîn reş
Li ser serê te dikim
siheka hênik û xweş

Şîrîn:
Nazdarê, Şîrînê
Jin ji kesekî re namînê
Ka Silêman, Îskender û Newşîwan
Ka Key Xesro, Key Qibad û Ros-têm
Ka Firidûn, Dehak û evîndar-en
dil bi xem
Ka Mecnûn û Şêxê Sen'an
Hemû bar kirin û neman
De min bi eşqa xwe vejîne,
le bêna min teng e
Dê bimrim de li mi binê,
ne dereng e.

Pismîr Şero jî bi gotina Şîrînê
dike û bavê xwe dijuje û heyîna
wî dide jaran. Mîr jî xwe hazir
dike ku bizewice û ahengeke mezin
berhev dike. Di wê rojê de
Şîvan û çetên xwe êrisî koşkê di-
kin.. Şîrînê li oda xwe bûye û di-
bêje;

Şîrîn:
Xwedê zane
Ez ji bo Ferhadî me bi tenê
O yarê pîroz
Ji bo te me û min daye te soz.
Ü Şîrînê di cih de xwe dijuje.

Mîr Şero serxweş bûye û nobeda-rek hat ji re gotê;

Nobedar:
Mîr tu serxweş i
Şîrînê xwe kuştîye û hêj tu dinoşî
Ü va ye şer e û Şîvan û çetên xwe
Êrîşê koşkê dîkin
Mîr jî ji derdê evînê xwe kuşt û
şîvan û çetên wî jî koşk talan
dikirin û xwarin dane jaran. Şer
berdewam bû û Şîvan jî hate
kuştin û koşka Mîr hemû şewiti
û şahiya Mîr bû dojehaka mezin
û her dû evîndar jî ne gihiştin
miradê xwe.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

▲Hêka herî mezin teyrê deve dike. Hêka herî piçûk jî tewreke kolibrîjê re kolibrâ "cuce" tê gotin û li Jamaïkayê dîjin), dike. Hêka teyrê deve 18 cm. di-rêj e û çapa hêkê jî 15 cm. ye. Hêka kolibrîçükke pirr sey e. Dikare him bi paş de û him jî bi pêş enîşkê ve bifire û dikare wek helikopterê li hewa di çiyê xwe de raweste) tenê 6.2 mm dirêj e.

▲Li dinê dara herî bilind li Awîstral-yayê ye. Navê wê okalipstu e. Hoya 130 mitroyî dirêj dike û pişti ku bilindiya xwe digihije 100 mitroyî, hîn guluya dide.

▲Giyak bi navê "Giya bi çemçik" ku li daristanen Asyayê û Rojhilata Afrika-yê hêşin dibin, goşt dixwin. Wek ji navê wî jî tê fehmikirin çemçikên wê hene. Di nav van çemçikan de avek taybetî heye. Dema heywanen biçûk wek müşk, kev-

roşkên piçûk, çûk û hwd. dikevin nav van çemçikan, ew xwe dîgrin û dest bi xwarina nêçîra xwe dîkin.

▲Derya Spî wê rojek ji holê rabe. Ji ber ku Afrika sal bi sal ber bi bakûr ve dike. Ji xwe ji ber vê yekê ye ku li dorhê-la Derya Spî gelek caran zelzele çê di-bin. Li gor lêkolineran di dahatûyê de li ciyê Derya Spî wê çiya bilind bibin.

▲Leonard Russel ji Britanya Mezin e û ji alî tibbi ve miroveki taybeti ye. Ew dikare tiştên ku wek adeti neyên xwarin, bixwe. Russel dikare wek nimûne, cilêt, cam, ampûl û sêlik bi istah û bêyi ku jê nerehet be bixwe. Ji bo ispata vê yekê ew xistine rontgenê û filma zikê wî kîşandine û têde tiştên xwarî ditine.

▲Di nav heywanan de rekora avvex-warinê ya kerên bejî ye. Kerek ti di 15 saniyê de dikare 15 litre av vexwe.

▲Li İranê di sala 1969'an de ji bo du kesen ku pere xistibûn zimmeta xwe 7109 sal ceza hat birrin.

▲Kûsî dikarin 500 roj bê xwarin bimîn û tiştek bi wan nabe. Beq dikarin 12 meh, marê engerek 20 meh, dupiş salek bêxwarin bimîn.